Daxuyaniya çapemeniyê ya 16ê Hezîrana 2021an

Şêwirmendiya şexsî ya zêdetir dîsa pêkan e

Em li benda we ne!

Li gel randevûyên şexsî û pêş-plansazkirî yên li cihên têketinê, emê di heman demê de qada karûbarên şêwirmendiyê ya li aliyên din ên cîhê karê we jî berfireh bikin. Nirxên insidansê yên li cem me (frekansa rûdana bûyerên nû) dihêle ku em karûbarên şêwirmendiya şexsî dîsa berfireh bikin. Ji ber vê yekê em kêfxweş in ku dikarin randevûyên "di cih de", ji bo nîqaşkirina mijarên pîşeyî û performansê, wekî me berê jî kirî, destnîşan bikin. Ango çi ji bo perwerdehiyê, çi ji bo karûbar, wesfên meslekî yan jî ji bo mijarên ku divê alîkarî bê dayîn - emê vegerin peywendiya rû bi rû!

Bê guman, em di heman demê de şêwirmendiya bi riya têlefon û nivîskî jî didomînin.

Divê hûn bala xwe bidin çi?

Heke hûn dixwazin bi me re hevdîtinê bikin, ji kerema xwe pêşwext bi riya têlefonê randevûya xwe bigirin. Civîna şexsî bêyî randevûya pêşwext ne pêkan e. Rêgezên berdest yên paqijî û mesafeyê tên sepandin. Di nav de, li hemû odeyên navenda karsaziyê, parastina tendirûstiyê ya dev û poz jî helbet heye. Herwiha em pêşniyar dikin beriya seredanê biçin yek ji navendên testkirinê ku li gelek cihan hene, testa antijena bilez a bêpere bikin. Em hewl didin ku daxwazên randevûyên we di zûtirîn demê de bicîh bînin, lê gava ku ev yek ji ber kotaya bisînor her gav yekser pêkan nebe, ji niha de lêborîna xwe dixwazin. Ji kerema xwe di wextê xwe de werin randevûya xwe, da ku her tişt ji bo me û ji bo we dê hêsantir bi rêve biçe.

• Hemû kargehên me